

# ROJA NÛ

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdêa Sûriye û Libnanê; 10 Jîreyên Sûrî; ji bona welatên din 2 Jîreyên îngilîzî. Bihayê Hejmarêkê: 10 Qemerî.

Dîwan û gerîmendekariya Rojname: Bêrût-Birc; Weqîf Tabet, Telefona Dîwana: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanû.

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR DR. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

## CENG & SIYASET DEWRAN XURTBÛN

Ji bona xurtbûna peya an miletekî çar tişt divêtin: Mêranî, Bext, Zanîn û Dewlemendî.

### Mêranî, Bext, Zanîn

Mêranî dana Xwedê ye. Peya û miletî hene, Xuda mêranî daye wan û mirov û nîjadî hene ko nava wan tu ne. Her çend ji rast e ko gelek carî, peyayên tîrsonêk bi eqil û zanîne dibin mêr.

Gelek caran bext ji mêraniyê ye; lê dîsa bi zanîne peyayên kêmbext, çavê xwe vedikin, piştîya bêbextiyê nas dikin, xwe didilînin, diçeyînin û jê diqerin û xwe didin qenciye. Ji xwe heçî mîrxas in, her tim xwediyê bextê xwe ne, bêbextiyê na kin û heke yekî bêbextiyê li wan kir, dîsa xwediyê bextê xwe ne.

Mirov dikare bibêje ko zanîn, îtim û hiner, sinhet û destxet binyad û asasa her tiştî ye; stûna dinya û axiretê ye. Mirovê naşt, peyayê nezan, ne bikêrî dînyayê û ne ji axireta xwe tê. Destpêka zanîne ji xwendin û nivisandin e.

Tiştên ko em tim û daim, di dora xwe de dibînin an dibihîsin û li wan ecêbmayî dimînin, mîna avahiyên spehî, cilen çeleng, kûçê û kolanên paqîj û rastkirî; otomobil, telefon, telegraf, radyo, tîfîng, şeşderb, top, mitraloz, tang, balafir, noqav, waporên barkêş û yên şerî, trêñ hemî bi zanîn û xebatê çêbûne. Mirovên bêja ko ew sinhet çêkirine mîna zaroyên me zarobûn, nezan bûn, hayê wan jî zanîne tu ne bû, bîr ne dibîrin. Lê bavê wan, miletê wan ew xistin medrese û dibistanan, lê hîfî xwendin û nivisandinê bûn û bi xwendin û xebatê: zanîna wan her kurtir û xurtir bû û tiştên ko me li jor hejmartine û em bi xwe li wan dimînin ecêbmayî, çêkirine; wan tiştan kar û şixlê eqil û dest, u ilm û hinera wan in.

### Dewlemendî

Dewlemendî, ji zanîne ye û bê pere û dirhav tu tişt na re serî. Destê vala deng jê na ye. Lê di destê nezan, bêbext û nemerdan de pere bikêrî tu tişt na ye. Bi tîjîkirina zik û bi berhevîkirina zêr û ziv, qedrê tu kesî mezin ne bûye û nabe. Lê di destê zana û çameşkanê de pere kaniya qencî û rûspîtiyê ye; û pê peya û millet digihin miradê xwe.

### Xwendin û Nivisandin

Xort bîn, pîr hîn, heçî nezan in divê, dest bi xwendin û nivisandina zîmanê xwe bikin; û ne bêjin qiweta min na gihe vî tiştî; ez heq ji vî tiştî dernayênim. Tiştê ko zoreyên heft, heşt salî dikarin xort û mirovên sera jî dikarin. Ge-

## BER BI ENIYA DIWEMIN VE

Leşkerên Hevalbenda Pê Li Erdê Talyana Kirine  
Vegirtina erdê Ewripayê destpê kiriyê. Di eniya diwemîn de leşkerên hevalbend şerî qiwetên Mihwerê dikin. Eskerên emerkanfî û kenadî derketine erdê Sicilyayê, xeta parastina Mihwerê a yekemîn. Di nav bira leşkerên hevalbend û yên talyan û elemanî de şerîna xurt çêdibin.

### Di Nav Çar Rojan De

Hezar û Heştêd û Siî û Sê Tang û Heştêd û Şêst Balafir  
MOSKÛ—A.F.I. Ev çar roj in êrişên elemana dom dikin. Di nav wan her çar rojan de 1833 tang û 860 balafirên elemanî hatine xira kirin. 30.000 kuştîyên dijmin li erdê mane. Xesarên elemana: Roja Duşembê: 586 tang û 203 balafir; Sêşembê: 423 tang û 267 balafir; Çarşembê: 520 tang û 229 balafir û Pêncşembê: 304 tang û 161 balafir in. Eleman eniya Orel—Kursk—Bielgorodê de bi 500.000 şerevanî şerî me dikin. Qesda wan ev e ko dixwazin dora qerargeha Kurskê bigirin û qiwetên me yêñ ve qerargehê 00.000 esker jî qiwetên mayîñ veqefînin.

## GOTINÊN STALÎN

Miletê me gotinên Mareşal Stalin yêñ ko di bangîna yekê gulanê de hatine çapkirin ji bira ne kiriyê. Stalin digot: Dijmîna derbên eskerên me ên birûskîñ nas û tam kirine. Wextekî nîzing de, Ordiya Sor û Ordiyên Hevalbendên me, stoyê dijminîna bişknînin.

MOSKÛ—A.F.I. Rojnameyên rûstî dinivîsînin: Dewra etlahiyê qediyaye. Di eniya me de şerîna zor û xwîndar çêdibin. Miletên Sovyetîstanê her wekî dizanin dehwa wan heq û rast e, û Ordiya Sor xurt e, bi dilekî rahet li bûyera dinêrin.

## DANEZANA SOVYETÎ

### Êrişên Elemanî Bi Xurtî Dom Dikin.

MOSKÛ—Serfermandariya sovyetî dîde zanîn: Li 11-ê tîrmehê leşkerên me, di eniyên Orel—Kursk û Bielgorodê de, şerî qiwetîna dijmin ên mezin jî tang û peyadan bihevketî kirine, yêñ ko êrişa dikirin. Mîna duhî refên elemanî ên xurt tevkariya qiwetên xwe kirine. Di qada Orel—Kurskê de, hemî êrişên elemanî hatine paş ve birin; û leşkerên me bi êrişêke heja dijmin, jî gelek cihên ko şerî roja yekemîn de wan zêft kiribûn, derxistin. Di eniya Bielgorodê de, getil-tangekî dijmin li hin deran xetên me neqeb kirine. Di nav rojêke de 304 tang û 275 girgîrok û kemyonên elemanî hatine xira kirin an şkenandin, û çekê sovyetî ê hewayî û topeñ balafirîkeñ 161 balafir avêtine erdê. Ev xesarên ha di eniya Orel—Kursk—Bielgorodê de gihayê elemanî. Di vî eniyê de, li sariya sibehê dijmin jî nû ve dest bi êrişan kirine. Di qadeke din de elemana bi sê firçeyên zirhkirî rabûne êrişê; leşkerên me 13 êrişên dijminîna bi şunda zivîrandîne; 5.000 serbend û şerevaniyên wan hatine kuştin û li erdê mane.

MELBURN—R: Di Nû-Georgiyê de rewîşa eskerî gelek çakê, topeñ û refên emerkanfî tim û daim li qerargeha Japonî ya Mundayê dixin.

OTAWA—R: Bi awakî resmî di din zanîn ko General Jîro wê here xatîrxwaziya Kenadayê.

WESINGTON—A.F.I. General Jîro û Serekcimhûr Rûzwelt pev re taştê xwarine, Emîral Lehî jî li wê bû.

randina îş û karên me, heke jî destê me na ye; îş û karên me na çin serî, dawîya me destê xelkê de perîşan bûn e. Di Bêrûtê de dibistanêke kurdî heye; pînzde mirov ketine vî medresê; di nav wan de xortên bîst salî û peyayên çel û çel û penc salî hebûn. Ev di nav sê mehan de hîfî xwendin û nivisandinê bûn û îro Hawar û Ronahiyê dixwînin. Xebat şerî e, destavetê dibe rovî.

### Tbreteke Mezin

Beriya ko cenabê Mihemed-rehmet û silava Xwedê lê be — wefat bû, banî jîna xwe kir û jê re got: di mala me de, çend zêr hene; wan zêra, jî feqr û belengaza re belav bike: ko zêr di mala min de hebe, ni karîm herîm cem Xudayê xwa.

## CIHANEK



KITÊBA Mr. WENDEL WILKÎ

«Bi milyonan insan li welatên Rohelatê dîr û nîzing û der erdên din minêkarî azahî û serbestiyê ne û ew miletên he naxwazin dewletên biyanî tîkîlî îşê welatê wan bibin.»

Mr. Wendel Wilki, yê ko nîmî-nendeyê Serekcimhûrê Emerkayê Mister Rûzwelt e xas e, û par li dînyayê geriyayê û çûyê erdên Iran, Iraq, Sûriye û Libnanê û hatiyê Bêrûtê jî, bi navê «Dinyayek» KITÊBEKE heja nivîsandiye: Xelkê Emerkayê jî vî kitêbe gelek hez kirine û her hefte jî Mr. Wendel Wilki re, li ser kitêba wî, pênc sed kaxez û reşbelek têne rêkirin.

Mr. Wendel Wilki, qala wan mektûb û kaxeza kiriyê û gotiye: Mana wan kaxezên ko jî min re tîne rêkirin ev e; xelkê Emerkayê diwazîzin ko wezîra Emerkayê di pêçîya miletên cihanê de çî ye, bi awakî vekirî, rast, pak û paqîj û bê şik û şîbhe hête gotin. Xelkên Emerkayê diwazîzin: wezîra Emerkayê wîlo bibe ko Emerka hisabê milyonên xelkên Rohelatê-Dûr û Nîzing û miletên Cihanê ên din bike yêñ ko hero, bi awakî hej xurtir û germîr, minêkarî azahî û serbestiya welatê xwe ne û na xwazîzin ko dewletên biyanî tîkîlî îş û karên wan bibin.

Xelkê Emerkayê dîtdikin Emerka û Êris destê hev û du bigirin û pev re bixebit in. Miletê Emerkayê jî aliyê din dixwaze bi xweha xwe î demokratî mezin Brîtanya, ya ko jî miletên aza û serbest bihevketî ye tevkariyê bike, da ko ew pev re mîftiya cihaneke aza û serbest, cihana miletên aza û serbest peyda bikin.

zanan diqewirtne, noqav pê sivik dibe û hêdî hêdî bi ser rûyê behrê dikeve. Ji bona noqaveke nûjîn noqav avê bûn û jê derketin îşê çend deqlqan e. Li rûyê behrê noqav bi motorên banzîñ û mazotê û di bin behrê re bi motorên elektîrîkî dimeş e. Di noqaveke de li gora mezinahiya wê 20, 30, 40 peya bi cih dibin. Noqav bi top û torpîlan bi çek kirî ne. Çekê noqavê e xurt torpîl e, û noqav dikare torpîla xwe beî ko derve rûyê avê berde waporên dijminîna. Torpîla ko xwe çê xwe girtiye jî bona wadan mexzanê, ev hewa avê jî, nex-

## NOQAV

### Çawan Noqî Avê dibin

Noqav çawan noqî avê dibin? Di tenîştên noqavê de, mexzeneyîna mezin hene, gava noqavê divê noqî avê bibe, deriyên wan mexzena bi mekînan hêdî, hêdî têne vekirin, av dikeve wan mexzenan û bi vî giraniyê noqav noqî avê dibe û kûrahînimîna pêş fermandarê noqavê dike, noqav çend mêtîr di kurahiyê de ye. Ko naqav noqî avê bû, ji bona ko fermandarê noqavê bikare dora xwe bibîne, li ser borîyêke dirêj, mîna stûnek dûrebînek heye, jê re pêriskop dibêjin, ew tîte derxistin rûyê avê. Noqava ko deh mêtîr kûrahiya behrê de ye, dikare bi vî perîskopê dora xwe bibîne. Heke jî deh mêtîran bêtir noqî avê bû, êdî perîskop bi kêr naye. Di vî halî de deng û pêjînen pêlên behrê rêberê fermandarê noqavê ye û ji bona zêftîkirina wan deng û hejanan, weke yêñ perwaneyên waporan deng û hejanîna hene; mîna saetîna mezin. Gava fermandar li wan saeta dinêre dizane heke li rûyê behrê wapor hene an ne û heke hene çend mîl dirêj û ber bi kû ve di e.

Gava noqav dike derve berde waporên dijminîna. Torpîla ko xwe çê xwe girtiye jî bona wadan mexzanê, ev hewa avê jî, nex-

# DEMA HINA

## CEJNA SERBESTIYÊ

14-ê TIRMEHÊ CEJNA FRENŞIZA YE

14 Tirmehê ne bitenê ji bona frensiza, lê ji bona hemî miletên ko ji azahî û serbestiyê hez dikin rojêke heja û cejneke mezin e. Berî 154 salan li 14-ê tirmehê xolkê Parisê deriyên zêndana Bastilê şkenandin, û bêsûçên ko têde bûn jê xelas kirin û ev ro bû destpêka azahî û serbestiya miletê Frensê û esasên ko piştî wê serfirizayê hatine danîn, bi navê «Beyana heq û kevneyên insana» de cihanê de nav û deng dane. Beyanê digot; karên siyasetî û civakî de, heqê hemî insana mîna hev e. Divê tu kes têkilî dîn û baweriyên mirovên din ne be. Divê mirov bi serbestî bikare baxêve û binivîse û fikra xwe bê tirs bibêje. Ev esasên heja, bi destê miletê frensîzê e mezin hatine danîn û wê ronahiyê erdê Ewropayê ronak kir. Roja 14 ê tirmehê ji bona hemî miletên dinyayê rojêke mezin e, yên ko gihane azahî û serbestiyê û miletên ko ji bona azahî û serbestiya xwe, dixebitin. Îro ji frensîz şanfî dinyayê kirine ko ew jî, mîna bav û kalikên xwe, ji azahî û serbestiyê hez dikin, û herçend jî welatê wan ketiye destê dijminan, frensîzên mayî dev ji şerê dijminan bernedane û ji bona mezinahî, azahî û serbestiya Frensê her fidakariyê dikin û xwe didin kuştin. Welatê ko kuren wî jê hevqas hez dikin, her serbilind dimîne. Frensa bê şik wê bigelê mezinahî û serbestiya xwe. Şahîrê frensîzê e mezin Viktor Hugo gotiye: Kuştina miletekî bê imkan e, ev tişt jî destê tu kesî nayê. Miletêk mîna stêrêkê ye. carna ewir dora wê digirin, lê rojêk tê û ev stêr jî nû ve dibiriqe.

# ILYA EHRENBURG

## QALA CENGÊN ENIYA ROHELÊT DIKE

MOSKÛ — Nivîsevanê rûsî e bi nav û deng Ilya Ehrenburg di rojnama Krasnaya Zvezda de dinivîse: Ev wextek e Hitler ji bona êrişêke mezin, tang û bombeavêj kom dikirin; Gelo çîre îro radibe û dibêje, ne min lê Urîsa êriş kirine. Cihanê dîtiye ko elemana dest bi êrişan kirine. Ma çîre Hitler wan derewa dike? Ji ber ko Hitler diitirse û tîrsa wî ne bitenê ji topên Urîsa ye, lêbelê ji miletê xwe ji elemana diitirse. Hitler hisabê xwe kiriye; û heke dît ko êrişên wî di eniya rûsî de ne çûne serî wê vegere û bêje: min ne dixwest êriş Urîsa bikim, xwîna elemana ji nû ve birejînim, lêbelê Urîsa dirêjî me kirine, û min jî, tiştê ko ji destê min dihat kiriye. Heke eleman hatine şkenandin, sebeb ne ev e ko eleman mîna berî şerê xwe bi xeyret na kin, lêbelê niho Ordîya Sor hêj çêtir şer dike. Hitler dixwaze dilê xolkê cihanê qanî bike ko tangên wî ji eniya Bielgorodê hatine Belgradê û balafrên di wî, terka Orelê dane û ketine qerargêhên peravên Behra Spî. Lê em çibikin, ji bêsîudiya Hitler Hevalbendên me, rastî çawa ye nas dikin. Tangên elemanî ji Belgradê rabûne û berê xwe dane Bielgorodê û refên elemanî ji balafrêgehên Behra Spî bi hewa ketine û daketine eniya Orelê; Hevalbendê dîsa dizanin ko di Orelê de ji Balqana bêfir balafrê hene. Em xwe diparêzin, lê di wan şerên parastinê de, derbine dijwar didin elemana û em dibêjin, emê wan bişkinînin û em pê qal in.

NÛ-YORK—A.F.I. Nihû her 5 deqîqan de, ji karxaneyên amerîkani balafirek derdikeve, ji destpêka serî û heta îro febrîkeyên amerîkani 115.000 balafrê, 60.000 tang, 1.000.000 kamyon, 1.500.000 mitralyoz, 600.000 tişîng û otomatîkên sivîk, 175.000 topên gir teslîmî ordiyên kenadî û amerîkani kirine

### DEQIQA DAWÎN

MOSKÛ—R: 500.000 esker di gelf, kortal, çiya û navdeştên axa Bielgorodê de şerî hev û du dikin. Ev hefta êrişê elemanî a diwemîn e, û elemana nikarî bûn tiştêkî heja pêk bînin. Hefta pêşîn de 2,670 tang û 1100 balafrên elemanî hatine xira kirin. Rojnama rûsî «Izvestiya» dinivîse: Edî tu şik ne maye ko eleman şikîyane.

CEZAYIR—R; Leşkerên hevalbenda, yekineyên, britanî, amerîkanî û kenadî bender û bajarên Sicilyayê ên jêrin vegirtine: Sirakuz, Avola, Paşîno, Gela, Likata, Ispika, Kostolinî, Noto, Skoglîfî, Ragûza û Augusta û wan 6.000 hêstîr girtine. Şerîne xurt dom dikin. Gaziya hevalhenda bê etlahî tê û derdikeve Sicilyayê.

LONDRE— Emîralya britanî dide zanîn: topên balafrîşîken yê waporên me ên bar û eskerkêş û balafrên me ên behrî di nav sê sal û sê mehên şerî de 1004 balafrên Mihwerê anîne xwar, jê pê ve 321 balafrên dijmin yê ko derbine giran xwarine, heye ko ketine û xira bûne; qiwetên me, ji aliyê dîn xesar gihandine 593 mekîneyên neyaran.

### Strana Kurdî

#### DERDO

Derdo, derdo...  
Mi di stêra sibehê li me zer da;  
Mi di li me şîr kir  
Gihayê çolê, nebatê hemû erda.  
Mi di şevê çuyê bavê min sêwlekê  
Di bazara min û te xeber da

Derdo, derdo...  
Ev sibe ye, ez qîmiş na kim  
Bêgê zirav ji xewa şîrîna rakim  
Ezê mîstî hilbînim, avê li destê kim  
Ezê bi guhê lihêfê bigirim  
Bi ser mîrê zirav dakim;  
Du qam ferza nîmêja sibehê  
Li begê min çûne  
Ezê rabim ji dêl mîrê  
xwe ve bi qeza kim.

Derdo, Derdo...  
Derdo heyran mi di li me derkeftî  
Stêra zer e

Mi di pêwir û mezênê li ezmanê hefta  
Xudan ber e  
Kuro mi j' te re ne go  
Zimanê te qelem e, singa min defter e  
Serê sibehê, mînakî melayê  
diwanzde elim,  
Tu dixwîni li ezber e.  
Sing û berê min yetama Xwedê  
Mînavî payetextê mîrê Kurdistanê  
Salê diwanzde meh  
Şer û qewxeyê diwanzde  
dewletên acasbî, daim li ser e;


# MIREKA CIHANE

MIRÊKA CIHANÊ MIRÊKA WÊNEYÊN ŞER Û AŞÎTIYÊ


## WÊNEYÊN ENIYA ROHELÊT



SERBENDÊN RÛSÎ ÊN EGÎD Û MËRXAS



ŞEREVANIYÊKÎ RÛSÎ MITRALYOZA XWE DIŞUXULÎNE.



XURTIYA PÛK Û BADEVA, ZINAR Û ÇIYAYÊN ASÊ, AV Û ROBARA NE XEMA WÊ NE.



# LE JOUR NOUVEAU

Direction : Beyrouth Wafiq Tabet  
Place des Canons Tél. : 74-01 et 81-41

QUOTIDIEN KURDE  
Directeur - Propriétaire : EMIR DR. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 10 P.L.S. - Abonnement  
Syrie-Liban 10 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

## Vers la Victoire

### CHRONIQUE HEBDOMADAIRE DE LA GUERRE

Bien avant que les feuilles d'automne aient commencé à sonner à tomber, la menace à laquelle la propagande axiste affectait de ne pas attacher d'importance vient de prendre corps.

Comme un coup de tonnerre la nouvelle des premiers débarquements en Sicile, la nouvelle de l'ouverture du « DEUXIEME FRONT » nous parvenait Samedi matin—Nos ennemis ont maintenant à faire face à deux menaces capitales: à l'Est, sur le front Russe et au sud, actuellement, sur le front de la Méditerranée, front qui pourrait dans un très proche avenir, se transformer en front Balkanique.

L'offensive aérienne extraordinairement concentrée de ces dernières semaines et spécialement des six jours qui précéderent les débarquements laissait prévoir l'imminence d'une opération dans le secteur italien. — Et l'offensive allemande contre le saillant de Kursk avait encore renforcé l'impression très nette que le moment était venu pour les alliés de créer en Europe un abcès de fixation capable de gêner les Allemands dans leur offensive. Il serait vain de parler des buts que ceux-ci proposent d'atteindre à l'Est. Cependant deux hypothèses sont plausibles; ou bien leurs attaques sur le front relativement restreint de Bielorod à Orel sont le prélude d'une attaque générale et dans ce cas, ils ne pourront plus compter sur toute leur aviation, ni disposer indéfiniment de troupes d'assaut, ou bien ces attaques d'une extraordinaire violence sont destinées à réduire le saillant de Kursk dont ils pouvaient craindre que les Russes ne fissent une base de départ pour une offensive d'été. Selon les dernières informations, malgré les pertes fantastiques en tanks, avions et hommes que les Allemands subissent, ceux-ci n'ont obtenu aucun résultat substantiel. Et le potentiel en hommes et matériel de nos alliés Russes est si considérable que la menace dont nous parlions dans la deuxième hypothèse restera réelle et se sera même aggravée du fait de l'énorme saignée que l'Armée Rouge pratique dans les rangs ennemis et de la nécessité où les Allemands se trouvent maintenant de se défendre en Italie.

Les nouvelles qui nous sont parvenues du front de Sicile, ne peuvent pas être encore très précises. Mais le Haut-Commandement annonce que les opérations se déroulent de façon très favorable. La côte Sud Est, d'un point situé au sud de Syracuse jusqu'à Gella et entièrement contrôlée par les Alliés. Un nouveau débarquement, a eu lieu Diraanhe près de Marsala et déjà trois aérodromes importants sont occupés. Le ravitaillement se fait

## LES DEPECHEES de la NUIT

### RESUME DES NOUVELLES

**MEDITERRANEE:**— Les forces alliées en SICILE contrôlent tout le littoral de la côte sud-est de l'île, depuis la ville de GELA au sud jusqu'aux environs de SYRACUSE sur la côte est. Des renforts continuent à affluer sans arrêt.

**RUSSIE:**— Toutes les attaques allemandes ont été enrayées tant au nord qu'au sud de KURSK.

**FRONT OCCIDENTAL:**— Patrouilles offensives de la R.A.F. au-dessus de la Belgique et du nord de la France.

**PACIFIQUE:**— L'étreinte des troupes américaines se resserre sur la base japonaise de MUNDA. Des unités de guerre ennemis sont attaquées par les bombardiers américains.

**ALGER (R):**— Les forces alliées ont pris contact avec deux divisions régulières de l'Axe bien supérieures aux troupes qui défendaient la côte. Malgré cela, la résistance n'est pas beaucoup plus forte.

**ALGER (R):**— On apprend du Q.G. Allié que des forces britanniques ont débarqué sur les plages du Catane.

## LA PRODUCTION ALLIÉE

LES ETATS-UNIS PRODUISENT AUJOURD'HUI UN AVION TOUTES LES 4 MINUTES ET 40 SECONDES

M. Donald Nelson, Chef de la Production de Guerre Américaine, qui se trouve actuellement en visite officielle au Canada, a déclaré qu'avant la fin de cette année, le continent nord américain produira un avion toutes les 4 minutes, 24 heures par jour et sans interruption.

M. Nelson a ajouté: «En 1939; après plusieurs années d'intenses préparatifs pour la guerre, les puissances de l'Axe produisaient pour environ 12 milliards de dollars de munitions. A cette époque, la Russie produisait de son côté pour près de 7 milliards de dollars, tandis que la Grande-Bretagne, le Canada et les Etats-Unis réunis, ne produisaient que pour 2 millions de dollars d'armement par an, soit 1,60 o seulement de la production de guerre de l'Axe.


Déjà en 1942, les Nations Unies dépassaient le rendement de l'industrie ennemie dans une proportion de 2 à 1, et en 1943, la production des Alliés atteindra le triple de celle de l'Axe. En 1944 elle sera près de 4 fois supérieure à celle de l'ennemie. Telles sont les perspectives de l'avenir.»

Parlant de la production américaine et canadienne, M. Nelson a déclaré que plus de 175.000 pièces

normalement grâce à l'activité incessante de l'aviation et de la marine.

L'enjeu de cette première bataille de l'Europe est si considérable, qu'il est probable que la résistance des Italo-Allemands sera opiniâtre, mais aussi qu'il est certain que les Alliés ont tout prévu et tout mis en oeuvre pour que cette première prise de contact avec le continent soit un écrasant succès.

D.



d'artillerie lourde ainsi qu'un million et demi de mitrailleuses, autant de camions, 60.000 tanks, 6 millions de fusils et de mitraillettes, 270 millions d'obus et près de 25 milliards de cartouches avaient été livrés aux armées de ces deux pays.

Voici d'autre part un tableau comparatif de la production des matières premières dans le camp allié et dans celui de l'Axe.

**ACIER:** les Nations Unies en produisent trois fois plus que les puissances de l'Axe et les pays occupés par l'ennemi pris ensemble. La seule production d'acier des Etats-Unis est le double de celle de toute l'Europe et 10 fois celle du Japon.

**PETROLE:** les Nations Unies produisent les 80/o de carburant du monde. Les pays de l'Axe seulement 7/o.

**CHARBON:** Les mines des Nations Unies ont un rendement de 67/o de la production mondiale, celle des pays de l'Axe de 31/o.

**BLÉ:** les Nations Unies produisent 3,5 fois plus de céréales que les pays sous contrôle de l'Axe.

**COTON:** Nations Unies 82/o de la production mondiale, Axe 7/o.

**OUTILS:** Nations Unies 62/o de la production mondiale, pays de l'Axe 17/o.

**ZINC:** Nations Unies 68/o de la production mondiale Axe 30/o.

**ALUMINIUM:** Nations Unies 60/o.

**CUIVRE:** les Nations Unies disposent des 90/o de la production mondiale.

**PLOMB:** la production alliée est 4 fois celle des pays de l'Axe.

## POEME KURDE

### LA MORT DU SOLEIL

Des flammes encore, des flammes  
Des cascades de sang,  
Des roses fraîches  
Qui brûlent dans un étang.  
Ombre obscure, souci macabre.  
Soupir des rochers,  
Terreur humaine  
Sur une pente accrochée.  
Souffle des géants  
Qui éteint les flambeaux,  
Masse laide et sombre  
Qui étouffe le beau.  
Blessure terrible  
Aux poitrines des cieux,  
Qui fait pleurer l'homme  
Et attriste les Dienx.  
Le soleil est tué,  
La lumière est morte,  
On allume les lampes  
Et on ferme les portes.

### QUESTION

Pourquoi les armes amères  
Dans ce monde éphémère?  
Rions plutôt  
Entre une coupe et une rose,  
L'hiver approche,  
Le temps devient morose.  
Cette fleur de la vie  
A peine épanouie  
Pâlit; et les corolles tombent  
Sur les tombes.  
Des ombres passent, des rires,  
des sourires  
Le festin prend fin  
Dans un faible soupir.  
Et pour supporter  
Cette flamme immense du coeur  
Ma soeur  
La poitrine est trop faible.  
Dans le fond de notre être,  
Peut-être,  
Avons-nous le soleil  
Sans en avoir le ciel.

DR. BEDIR KHAN

## LA PRESSE KURDE

Nous signalons, à nos lecteurs s'intéressant au mouvement culturel KURDE, les journaux et périodiques kurdes suivants:

- RIYA TAZÉ**, organe des Kurdes de l'U.R.S.S. paraissant à Erivan.
- GALAWÉJ**, la plus grande revue littéraire kurde, paraît chaque mois à Bagdad, avec 80 à 100 pages de texte hebdomadaire politique et littéraire paraissant à Souleimanié.
- JIJAN**, revue littéraire bi-mensuelle paraissant à Damas. Textes kurdes et français.
- HAWAR**, Revue mensuelle illustrée, paraissant à Damas.

**MOSCOU (R):**— Le correspondant de Reuters mande: «On peut dire aujourd'hui avec assurance que les jours critiques de l'offensive d'été allemande ont été surmontés et les résultats ont été entièrement favorables à l'armée soviétique. La bataille pour Kursk n'est pas encore terminée mais l'Armée Rouge dans ce secteur est entrain d'user les forces de Von Kluge. L'armée allemande, comprenant au début de la campagne 250.000 hommes, appuyée par plus de 2.500 avions et 4.000 tanks, dont probablement un millier de tanks «Tiger» a subi un échec cuisant.»

**ALGER (A.F.I.):**— Radio-Alger annonce que le général Montgomery conduit ses troupes vers Catane.

DI WELATÉ ZEMBEQÉ GEWIR DE

Nivisevan  
Grigori Petrof

Wergerlandok:  
Qedri Can

8

— «Binêrin! ji kenewêrê çawan benan dirêsin? Berê; qaşilê kenewêr a zirav dîtînin û ji wê benê zirav çêdikin û van çend benan li hev dirêsin... benê stûr derdixin û ji van benên stûr ji çendan bi hev girê didin û bi wan werîsên pir stûr, ên ku di gemiyan-de dixebitînin, çêdikin...

«Xebata me jî, mîna wî karî ye. Divê em jî, minewerên xweyên jî hev bela bûyî bicivînin û bi wan, jî mîletê xwe yê du milyon re quwetekê çêbikin...

Senelman, di paydosa havîne de mamosteyên dora xwe li ciyekî dicivand, ji wan re qursek jî sê; çar heftan çêdikir. Ji sedî bêtir mamoste diketin van qursan. Lê di pêşya pêşin de, mêldarî hindik bû... pirê mamostan, di quncikên welêt de, zivistanê pède, ji xebata xwe aciz dibûn, û ji xwe, ji karê xwe ne dixweş bûn... bi kotekî yanî bê dixwazî diketin qursan. Heta hinekan jî wan digotîn: «e man, ev qurs jî, ji ku, bû bela serê me? Daxwendina mamostan, di hate bîra kê?» gîlî û gazîne wisan dikirin.

Senelman, ev tiştên ha giş dizanf bû, lê ne dixeyidî. Wî, mîna tuxtorekî, li insanana dimêrî û digot:

— «Hevalên şêrial ez zanîm ku karê we çiqas giran e... û ez, di zanîm ku ev karê we yî dişwar, xelkê me teqdir nake... ez, fam dikim ku jiyîna we ya madî jî xerab e... Lê em çi bikin? Hûn, jî bîr mekin ku em dixwazin mîletê xwe hişyar bikin... û me, nuh dest bîvî karê mezin kirî ye...

Em, pêçdarê Orduya mearîfê ne. Em, bi nezaniya mîlet re şer dikin. Divê, barê giran li piştê me be. Di be ku cara pêşin me teqdir ne kin... emê fedakariyê Bikin... jî nav xwe qurbanan bidin... ev tiştekî lazîm e... na be ku em, xwe jê bî dîr xin.... Ez we vedixwînim fedakariyê... Ez, ban wan kesan dikim ku dixwazin xwe feda bikin. Li kêmaniyê me nêrin, eşkere dibêjim: mîna di her meslekî de tê dîtin, di nav mamosteyan de jî gelek biyaniyê meslek hene. Evênha meslekên xwe kêr dibînin... jî ber ku xwe mîna paleyên rojê dizanfîn...

PÊJINÊN DINYAYÊ

GEFLE WAPOREK GIHAYE BENDERÊ



Serekcimhûr Mr. Rûzwelt gotî bû, çekirina çek û posatên şerî karekî mezin e, lê gihandina wan benderên Ewriya, Sovyetistan û Efrîqayê karekî hej mezin e, jî ber ko di Etlantîkê de û li behrên dinyayê ên din noqavên Mihwerê û xesma yên Germanîstanê di kemîne de ne. Lê îro rewîşa dinyayê guherîye; Hevalbenda isul û tedbîrîna nû peyda kirine yên ko piştê noqavan şikestîne, û qeslewaporên hevalbend ên mezin, çek, cebîlxane zad û zexîre dagirtî di behrên dinyayê de geşt û guzar dikin û barên xwe ên heja digihînin benderên erdên hevalbend.

Balafr û balafr

Li gora hesabên ko hatine çêkirin febrîkeyên hevalbend niho jî yên Mihwerê sê car bêtir balafr çêdikin. Di nav meha gulane de, karxaneyên amerîkanî 74,000 mekîne teslîmî hikûmetê kirine.



XEBER Nûçeyên Dinyayê

CEZAYIR—R: Qarargeha Hevalbenda a mezin li Efrîqa Bakurî di-de zanî: Roja sembê, her çend jî hewa nexweş bû, di sariya sibehê de, saet 4-, piştî ko stola me topên asêgehên peravan lal kirine û jî qiwet xistine; leşkerên me li saet şeşan derketine erdê Sicilyayê, û li saet heft û nîvan, dest bi pêşveçûnê kirine. Şer dom dike. Stolên bîrtanî û amerîkanî jî nûve esker top û çek posat derxistine Sicilyayê.

SICILYA

Sicilye giravoekê talyanî ye, 25.712 kilometre çargûşê ye. Rûniştîmanên di wê 4.000.000 (çar milyon) in. Çiyayê wê ê agirî «Etna» 3,313 mêtir bilind e. Hewayê wê xweş û erdê wê bi hatin e. Bajaren wê ên mezin û xelkên tê de ev in: Palerm 390.000, Katane 228.000, Mesîne 200.000, Trapanî 71.000, Kalkanîseta 51.600, Sirakûze 50.000, Ragûze 50 hezar, Ehrîgênto 30 hezar, Ena 23 hezar, Marsala 57 hezar, Elkano 51 hezar, Modîse 43 hezar.

Heftesed sal berî Îsa Pêxember, cara pêşin, Fenîkî û dû wan re Yewnanî ketine axa Sicilyayê û dest bi avakirina bender û bajaran kirine. Erdê tatyana bi xwe yê ko

Khergiravek e — 156.780 kilometre çargûşê ye, şîrehiya giravên talyanî 60 hezar kilometre çargûşê ye. Rûniştîmanên Italyayê çel û du milyon in.

ROME — Radyoya Romayê gotiye; Dora me hatiye. Em di cihê xwe de giran in û dilqewî ne.

LONDRE — Bi awakî resmî di-din zanî: bombeavêjên amerîkanî ên giran û refên bîrtanî jî bombeavêjên sivîk bihevkefî halafîgehên erdê Frense vegirtî dane ber bomban.

MOSKÛ — R: Di nav 36 saetên dawîn de, şerê tanga ê zor dom kirîye, li derên ko elemana xetên

me neqeb kiribûn. Merçend jî rewîşa eskerî zehmetir bûye, tu taluke nîne. Pêşmerên elemanî cehda xwe dikin da ko bikarin ber bi Kursk û ber bi bakur-rohelatî ve pêş ve bikevin û rîya Kursk û Voronejê bibirin.

LONDRE — R: Wezareta Bîrtanî a hewayî elam dide: Refên bîrtanî duhî di ser axa Frense û Holenda vegirtî re, Frîyane û karê xwe ê dîdevanî û nobetdariyê pêk anîne, Fîfon û Mustengan dî ve navê de 2 balafirên dijmin avêtine erdê. Di peravên Manşê de gelek lokomotiv û waporeke torpîl berhevker hatine xira kirin.

TOPEKE ELEMANI

Di eniya rohelêt de şerîne zor û xwîndar destpê kirine. Eleman careke din berîya ko zivistan bî, siûda xwe diceribînin. Şerevaniyên rûsî, topeke elemanî jî îfpe mezin standîne û lê siwar bûne.

Li mêraniya ko şerevaniyên rûsî — jin û mêr tev de — şanî dijminên xwe kirine, xelkê cihanê ecêbmayî maye.



DÛRIK

DÛRIKÊN LI BER TEMBÛRÊ

DÛRIK

Kaniya Helê li mêrgê ye Ez xulam sê biskê şê ye Berda li alkî bê ye T' ez kuştim, t'ez helandim T' ez kirim duhnê çirê ye

Bejin şîva dehlê ye Rûsor jî pelê gulê ye Şê bisk jî telê perde ye Her lê lê, her lê lê.

Sing û berê te gewr in Wek berfa li zozana Wek penêrê qerece daxê Serê memka hildayê Wek sêwê Meletyê ye Pirtiqalê Şamê ye.

Serê çelê zivistanê Destê van teresê beqala Davêjin ber terezîne yê Her lê lê, her lê lê.

Kaniya Helê li Merzeqa W' ez xulam enî bi deqa Ezê gewrê birevînin Emê xwe bavên Her sê sinceqa Her lê lê, her lê lê.